

WASHAP - BENSHEH  
NEVALTI - DOSTA

WWW.CIRCA.PAKURDIA

## BERBANG

Organa Federasyona Komelên Kurdistanê  
Li Swêdê  
Organ för Kurdiska Riksförbundet

**Berpirsiyar**  
Mahmûd Lewendî

**Redaksiyon**  
Bavê Nazê, Cemşîd Heyderî, Dara  
Reşîd, Fehmî Kakeyî, M.Lewendî,  
Mueyyed Teyib, S.Rêving

Sättning och layout  
Broyê Macir, Bavê Rojbin

Adress  
Box 45205  
S-104 30 Stockholm

Telefon  
08/68 60 60

Postgiro  
64 38 80-8

Abonetî/Prenumeration  
Kes/Enskilda: 100 Skr./sal-år  
Meqam/Myndigheter: 200 Skr./sal-år

Îlan/Annonc  
Rûpela pašîn/Baksida: 2000 Skr.  
Rûpelên navîn/Insidor: 1000 Skr.

**Ansvarigutgivare: M. Lewendî**  
**Redaktion: B. Nazê, C. Heyderî, D.**  
**Reşîd, F. Kakeyî, M. Teyib, S. Rêving**

Redaksiyon ne berpirsiyarê nivîsarên bi îmze û axaftinên Federasyonê ye. Nivîsarên ku ji Berbangê re tên şandin, heke çap jî nebin, li xwedî nayên vegerandin.

ISSN-0281-5699

Sal 7, Hejmar: 4/88 (49), 21.04.1988

Newroza îsal bi awayekî girseyî hate pîrozkirin. 2000 kurdên ji her çar parçên Kurdistanê di vê roja xwe ya şahiyê de hatibûn ba hev.

Lê, gava ku reşe-mizgînîya Helebçê hate bihîstin, ev şahî û kêfxweşî di şînê wergerîya.

Pênc hezar kes, kesên kurd; jin, zarok, pîr û xort di nav bîstekê de bi bombên jehrê hatin qirkirin.

Li ber çavê Seddam'ê pîs û genî, wekî pênc hezar mêş hatibin kuştin! Û bi serde jî; berdevkê Seddam, Tariq Ezîzî ji tevayîya dunyê re dibêje: "Ji bo parastina dewleta xwe em mecbûr in bombeyên jehrê li hember kurdên hemwelatîyên xwe bi kar binin, divê hûn van kirinên me xweş bibînin!" Û dunya jî xweş dibîne.

Ji berê da bav û kala gotîye:


"Zêr zane  
Zor zane  
Devê tîfinga mor zane!"

Ne tenê dunya doyîn, a îroyîn jî tenê ji vê gotinê fam dike.

Berpirsiyar

**DI BIN ALA FEDERASYONÊ DE**

# **Me Newroza Îsal Bi Hevûdu Re Pîroz Kir**



**.Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê, di  
19.03.1988'an de li bajarê Stockholmê şahîya  
Newrozê bi beşdariya 2000 kesên Kurd, Swêdî  
û bîyanîyan pîroz kir.**

Newroz îsal ne wek her salî bû, ev cara pêşîn  
ji hemû perçên Kurdistanê hewqas kurd di  
şahîya xwe ya netewî de hatibûn ba hev.

Ji dewlemendîya programa Newrozê her kes  
kêfxweş bû:

Foto: Cemil Elbakî



Federasyonê îsal li Stockholmê, di salona Konserthusetê de şahîya Newrozê pîroz kir. Şahîyê di 18.30'an de bi axaftina Serokê Federasyonê Keya Îzol ve destpêkir. Piştî wî zarokên daghema (Kreş) Kurdî ya Tenstayê bi çend sitranên Kurdî û Swêdî programa xwe pêşkêş kirin di dû re Koma Grûba Folklorazarokan ji Bolnâsê bi listikên xwe yê ji dor hêla Swêregê şahîya Newrozê geştir kirin. Ferhad Baban ku ji Kurdistanê Îranê ye wek solo hin sitran di awayê operet de got. Piştî Koma Folklorazarokan ku listikên ji dorhêla Mutkîyê pêşkêş kirin, programa Şivan û Gulistan destpêkir.



Di beşî dueminê şahîyê de Grûp NAMO li gel orkestrayê dewlemend û dengbêjên xwe gelek sitranên



dilîni û folklorîk ên ji Kurdistanê Îraqê pêşkêş kirin, her weha gelek kesan ji li gel sitran û musîka wan govend kişandin. Di dû wan re Koma Dîlan govendên ji hêla Entebê pêşkêş kirin.



Grûp Namu



Nasirî Rezazî

Dengbêja bi nav û deng Şîrinê jî bi dengê xweyê şîrin şahîya Newrozê geştir kir. Nasirî Rezazî'yî bi awaz û dengê xwe rengê din da şahîyê. Di dawîya programa şahîyê de Şivan Perwer careke din derket sahnê û bi tembûr û orkestra û dengê xwe, xweş lîxist û xweş sitra.



Grûp Govend

Bi munasebeta şahiya Newrozê ji Federasyonê re hin mesaj û pîrozbayî ji hatin. Partî, komele û kesên ku mesaj sandibûn ev in.

- 1- Komeley Kulturî Kurd le Örebro (Rehman Sofî)
- 2- Komela Kurd li Botkyrka- Komîta Karger
- 3- Tipî Topî Pêy Kurdistan le Stockholm.
- 4- Koç-Kak (Swêd)
- 5- Komîta Reistinî ya Yekitîya Sosyalîst a Kurdistan
- 6- Södermalm föreningen mot Rasismen- Stockholm li Södermalm
- 7- Komela jinên Demokrtên Kurdîstanê li Swêd.
- 8- Enstituya Kurdî ya Parisê- Lütîfî Baksî
- 9- Koç-Kak (Hollanda)
- 10- Rizgarîxwazên Netewayî Kurdîstan-Baskê Sosyalîst
- 11- Yekitîya Ciwanên Kurd li Swêdê
- 12- Hêviya Gel- Liqê Swêd
- 13- Rêxirawî Xwendikaranî Sosyalîst Kurd le Ewropa
- 14- KOM-KAR- Swêd.



Destpêka jiyaneke nu ye îro  
roja nu  
**NEWROZ**  
Jiyane **NEWROZ** bermaliya min  
Jîn e  
Evîn e  
Ji hezar salan û vir de  
berxwedan e **NEWROZ** dilbera min  
serfildan e  
li hember hovan  
xwînxwaran  
zor  
û  
zordaran  
serketin e  
Stran e **NEWROZ** cana min  
Di dengê bilbilê bê nav de  
Di devê tivinga **PÊŞMERGE** yên qahraman de  
bang e  
li serê çiyayê bi mij û dixan  
çiyayê **ARARAT**ê  
**METÎNAN**  
**ZAGROS**  
Çiyayê **KURD**  
çirûsk e  
Berbang e **NEWROZ** dilê min  
bihar e  
bi kulîlkên rengîn xemilandî  
rihan

binevş  
sosin  
gul  
Tirêja roja rengîn e **NEWROZ** gulîsora min  
roja can pê dijîn  
roja dijminê şeva reş  
tarî  
bêdeng  
avis  
û  
bi tava giran  
dagirtî  
Şeva  
stara dizan  
gurên  
dev bi xwîn  
weke gerdên û sîng û berê  
gulîzera nûgîhaye **NEWROZ** hesreta min  
Gulîzera bedew  
bo  
canek teze amade  
gihîştî  
maka hîmê hûnandinê  
destpêkeke nû ye **NEWROZ** hatina min  
jiyaneke teze ye  
jîn e  
evîn e  
hêvi ye  
**NEWROZ**

**NEWROZ**

## Di şahiya Newrozê de Axaftina Serokê Federasyonê Keya Îzol

Xwişk û birayên hêja, mêvanên giranbiha,

Hûn hemû ser seran ser çawan hatine cejna Newrozê. Îro em bi hev er li dij kolonyalizmê, zilm û zordestiyê, ji bo hebûna xwe ya netewî, sembola hêvî û rojên baş cejna Newrozê pîroz dikin.

Roja Newrozê di tekoşina gelê Kurdistanê de rolekî mezin dilize. Ne tenê li welat, herweha li hemû derên ku Kurd lê dijîn, cejna Newrozê bûye nîşana xebat û piştgiriye, bûyereke girîng ku me hemûyan tîne cem hev, daxwaza bihevrebûn û yekitiya me tîne ziman. Di vê rojê de em, hemû Kurd, bi dilekî germ, li hember hevûdu bi tehamul, ji bo doza Kurdistanê yek can û yek dil dibin. Hêztirbûn û bihevrebûna me dilê me hemûyan şa dike, qewetê mezin dide me ku em ji bo doza xwe ya girîng hîn zêdetir xebatê bikin.

Lê di aliyê din ve bûyerên ku îro li Kurdistanê çêdibin dilê me dişewitîne. Gelê me bi sedan sal li bin nîrê dijminên dagirker de dinale. Jin, pîr û zarokên me ji ber zordestiya dijmin, xizan û bêxwedî mane. Dewletên Kolonyalist li ser ku ew welatê me perçe û talan kirine, bi kiryarên xwe ve dixwazin roj bi roj li her derê Kurdistanê teda û zilmên xwe zêdetir bikin. Îro çavsoyîya ku li welatê me çêdibe, ji zordestî û tedayên rejimên nijadperest û faşî, wek Afrika Başûr, Îsrail û ji welatên diktatoriya ya Amerika Latin kêmtir nîne. Lê bi daxawa, dinê îro bêdeng e. Em divê ji bo piştgiriya doza Kurdistanê dawa ji hemû hêzên pêşverû û demokrat û birûraya giştî ya cihanê bikin. Xebatên weha pêwîst û girîng e. Lê daxwaz û hêviya

me ya sereke, ji mirovên Kurd bi xwe ye. Divê em Kurd bi hemû hêzên xwe xwedî li pirsê xwe derkevin, têkoşin û xebata xwe bêwestan bidomînin. Wek neteweyekî rêxistinbûyî bikaribin xwe îspatî hemû cihanê bikin, bibin hêvî ji bo miletê xwe.

Gelî hevalan,

Li Kurdistanê Tirkîyê, rejîma faşîst bi hemû hêzên xwe teda û çavsoyîyên xwe didomîne. Her çiqas di birûraya giştî ya Tirkîyê de sala dawî behsa pirsê gelê Kurd tê kirin jî, tu roj zordestiya dewleta Tirkîyê li ser gelê me kêmtir nebûye. Girtin, kuştin, nefî kirin her berdewam e. Zindanan dagirkeran bi insanên me yên

welatparêz tîjî ne. Ji sisiya dido yê ordiya Tirkîyê li Kurdistanê hatiye bicîkirin. Bi sedan gund tîn valakirin, bi îşkence, kuştin û nefîkirin, rejîma faşîst dixwaze gelê Kurdistanê wek netewe ji ortê rake.

"Rejîma faşîsta Iraqê li hember insanên me yên sîdî li ber çavên hemû cihanê çêkên kîmyewî bi kar tîne... Mîsala wê ya herî jîndar bajarê Helebce ye... 5000 kurdên sivîl bi bombayên jehrê qetîl kirin. Helebce kirin Hiroşîma daemîn."

Li Kurdistanê Iraqê, rejîma faşîst ya Seddam bi kirinên xwe, hemû qanûnên navnetewî daye bin lîngan. Roj tune ku ax, gund, û bajarên Kurdistanê neyîn bombebaran kirin. Bi sedan, hezaran mirovên welatperwer û xoşewîst tîn kuştin û dardekirin (îdamkirin). Gund û bajarên Kurdistanê tîn vala kirin.



Foto: Şoreş Zirek

Rejîma faşîst li hember insanên me yên sîvîl li ber çavên hemû cihanê, çekên kîmyewî bikartîne, hovitiya xwe herroj dide nişandan. Misala wê ya herî jîndar ji bajarê Helebçê ye ku bi awayekî wahşiyane û hovîtî 5000 kurdên sîvîl bi bombên jehrê qetîl kirin. Helebce kirin Hîroşîma duemîn.

Li Kurdistana Iranê, rejîma kevneperest û fanatîk Xumeynî li ser navê îslamîyetê, ji 1980 û vêda ye bi hemû hêzên xwe Kurdistanê bombebaran dikin, jin, zarok, mêr didin ber tanq û topan, bi hezaran insanên me mecbûrê muhaciriyê kirine.

Li Kurdistana Suriyê, gelê Kurd ji hemû mafên xwe yên netewî û demokratîk, ji mafên hevvelatîyê mehrûm in. Gelê me li vir ji wek perçên din, ji bo mafên xwe yên insanî û demokratîk tekoşîn dide.

Heval û hogirên me yên girtî di zîndanên kolonyalîstan de, di bin îşkence û zordestiyê de bin jî, bêyî ku teslim bin, roja hêvî û berxwedanê, cejna Newrozê, bi rik û înat pîroz dikin. Pêşmerge û girtiyên me yên qehreman îro bi xwîn û canên xwe dîroka Kurdistaneke azad û serbixwe dinivînin, ji bo xilasiya welat dibin rêberên nemir.

"Tenê yekîtiyêke esasî ya di navbeyna hêzên me yên siyasî de dikare pirsgrêkên me yên sereke çareser bike. Welatê me ji bin nîrê dagirkeran rizgar bike."

Em kurdên li Swêdê di bin baskên rêxistinîna me ya demokratîk Federasyonê de, tu car gelê xwe tenê nahêlin, kirinên kirêj ya dijmin ji bîr nakin. Ji bo ku dengê me xurtir û xebata me bi tesîr be, divê rêxistinîna me bihêz bibe. Tenê bihêzbûn, ne bes e, herweha bikaribe rêyên nû bibîne ku baştir alîkarî û piştgiriya doza Kurdistanê, tesîr li ser birûrayên cihanê bike. Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê bi program û prensibên xwe, bi xebata xwe ya rojane, ne tenê ji bo kurdên Swêdê, herweha ji bo gelek keşên me yên li welatên din jî, di warê demokratîk de, bûye minakek cidî û girîng. Piralî û bingehfirehbûna xebata Federasyonê baweriyêke mezin, daye hemû kurdên derveyî welat, çarçova xebata me firehtir kiriye.

Lê, hêvî û xwestina me divê hîn zêdetir bibe. Hêviya me ya pêşîn û sereke, yekîtiya hêzên siyasî ya hemû perçên Kurdistanê ye. Tenê,

yekîtiyêke esasî ya di navbeyna hêzên me yên siyasî de dikare pirsgrêkên me yên sereke çareser bike. Welatê me ji bin nîrê dagirkeran rizgar bike. Hemû kes û hêzên me yên siyasî û demokratîk divê ji bo vê armancê xebatê bike.

"Divê em bi her awayê xebatê bikin da ku rêxistinîna me yên demokratîk ji li Ewropayê hêzên xwe bikin yek... wê gavê dengê me bilantir û hêza me xurtir dibe..."

Lê, divê em di warê demokratîk de ji li îmkaneên yekîtiyê bigerin. Divê em bi her awayê xebatê bikin ku rêxistinên me yên demokratîk li Ewropayê hêzên xwe bikin yek, bi hev re hevkarîyên bingehîn bimeşînin. Wê gavê dengê me hîn xurtir, hêvîbûna me hîn bi bingeh dibe. Em wê gavê dikarin bi hêsantir pirsgrêkên derheqa zarok, ciwan, jin, penaberên xwe çareser bikin. Wek neteweyek organizekirî û modern hazirî ji bo civateke azad û serbixwe bikin.

-Bijî NEWROZ!



## Li Uppsalayê Newroz

Di 18'ê Adara 1988'an de li bajarê Uppsalayê ji alî Komela Kurdistanê ve cejna Newrozê bi şahiyêke gur hate pîrozkirin. Nêzîkî 400 kesên Kurd, Swêdî û biyaniyên din di şahiyê de beşdar bûn. Şahiya Newrozê ji alî programa xwe ve ji dewlemend bû. Senetkar, kes û grûbên ku di şevê de sitran û govend girtin ev bûn. Feqiyê Teyra (Nîzamettin Arîç), Faxreddin, Azad, Koma Govend (Folklor), Koma Dilan (Folklor) û Şîrinê ku wek mêvan hatibû şevê wê ji hin sitran pêşkêş kir.

Şahiya Newrozê bi kêfxweşî û dilxweşî dawî hat.

Şîrin

Komela Kurdistanê li Uppsalayê

# 90 Salîya Rojnamegerîya Kurdî



Îsal 90 saliya derketina rojnama "Kurdîstan"ê ye. Ku di 22'ê Nîsana 1898'an de li Qahirê ji alî Midhet Miqdad Bedirxan Begê ve hatibû derxistin.

Ev rojnama pêşîn a kurdî heta 1902'an jîyana xwe domand û li ser hev 31 hijmarên wê bi Kurdî (Kurmanjî-Soranî) û Osmanî derdiket.

Li Kurdistana Îraqê her sal roja derketina rojnama Kurdîstanê, yanê 22 Nisanê wek Roja Rojnamegeriya Kurdî pîroz dikin. Di hejmara dahatû de bi munasebeta 90 salîya Rojnamegeriya Kurdî emê meqaleyêke dûr û dirêj li ser rojnama Kurdistan pêşkêşî we xwendevanan bikin.

Berbang

## Civîna 2. a Komîta Giştî ya Federasyonê

Komîta Giştî ya Federasyonê di 03.04.1988'an de li Stokholmê, li Medborgahusetê civîna xwe ya duwemîn çêkir.

### Rojeva civînê

- 1- Ahadarî li ser xebatên ku hatine kirin.
- 2- Tesdiqkirina rapora xebatê ya Federasyonê
- 3- Tesbit û tesdiqkirina Komîtên xebatê.
- 4- Plankirina xebata 2 mehan (heta civîna 3.)
- 5- Bûyera Helebçê

Di civînêde li gel Komîtên kar yên berê, hin Komîtên nû ji hatin avakirin, ji van yek Komîta Helebçê'ye. Hin biryarên ku Komîta Giştî girtin ev in:

- 1- Divê di nav sînorên belediya Stockholmê'de ji bo Federasyonê xaniyek bête avakirin. Komîta Xani heta civîna 3., divê raporeke dûr û dirêj li servê meselê hazir bike.
- 2- Divê bi partiyên siyasî yên Swêdî re têkîlî bête danîn da ku bikaribin di parlamentoya Swêdê de "Komîta Kurdîstanê" ava bikin û endamên vê Komîtê tenê kesên parlamenter bin.
- 3- Li Stockholmê, li meydana Sergelstorgê dê ji bo protestokirina bûyera Helebçê imze bête berevkin.
- 4- Broşûrek bi Swêdî li ser Helebçê'ye bête derxistin.



Komîta giştî di civînê de



Ev nameya jêrîn do êvarê ji me re ji Çînê hat. Di vê sedsala 20'an de bi xêra poste û telefonan, êdî mirov dizane ku li kuderê kurd hene. Hun bi xwe jî dê bixwînin da ku li Çînê jî kurd hene. Zimanê namê me neguhert, her wekî xwe ye; yanê bi kurmanciya Çînê ye.

## Nameyek ji Çînê

**Hevalêng hêngja!**

Emg li vêng dergê ne geleking. Li gorg nufûngsa Çîngê emg engqelîyetekî pîrg piçûng têng qengbûlg kiring, Çimkîng emg tenêng heftêng(70) milyonging.

Mîntingqa ku emg lê dijîng, jêng re dibêjing "Çiyayêng Xûnang".

Çeng rongj berê me jî cejna Newngrozgê pîrozing kîrg. Dengbêjingê me yê bi naving û deng Şîng-Vang bi dengê xwe yê xweşing û tengbûringa xwe ya ringding sitranêng gelêring û folklorîng pêşkeşî me kurdêng Çîngê kîrg. Hongzang Şîng-Vang di dawîngê de sitranga mengşûr Kîng-Emg gotg û şevg xelas bûng.

Her wengha li vêng dergê me jî Engstîngtunga Kurdîng a Çîngê vekîrg. Hûng dikaring hemû kovaring û kitabîng û belavokêng xwe bişîning ser navnîşanga Engstîngtungê.

Ji bo hejmarînga dîng a kovarînga we, emgê ji weng re gotaringekê li ser nivîskaringê me yê mezing Mahng-Mungt Bang-Sîng binivîsing. Bimîning di xweşîngê de.

Brangê we Şong-Reş Wang Yû  
Çîng

Xessan Kenefani

# Li pişt derî



Xessan Kenefani

Çiroknivîsê bi navê dang, ya Filistinî, Xessan Kenefani 24 salana 1926-an ji dayikê bûye. Xwendanê xwe ya seretayî li bajare Yafa'yê li dawiya fime. Sala 1943-ê jî her rojê xwe di dijwarê şerê navbera erêbê û Israîliyanê de wek piranîya malbatê Filistinî mala xwe ji bo Libnanê migret bû û wê barîsînê te'zîre mezin li ser fîyana wî kir.

Pişt fîyanêke pir pirantê û zehmetê Xessan Kenefani li Samê li ci bû û bo çare yekê karêçirokê û paşgirtîyê wî di xêzîyê şerî de hatin xwendin. Kenefani herwextê li serê manîfesta xwe derûnê parawerên xî, Paqê Bî zanyêgehê Samê, di herê edelî de dest bi xwendinê xwe ya bilind kir. Bêlê jî her rojê xwe di xêzîyê şerî de derdixist.

Xessan Kenefani paşê di Xetêlê û dibe manîfesta xwe û spore. Li xêzîyê şerî "Ehê Lî" jî bo rojanên di xêzîyê.

Di mîwegepeke de xêzîyê wî ya bi navê "Kirazê herî fîna" xêzîyê xwe dîre.

Bêlê xêzîyê xwe Xessan Kenefani li rojanê de koranê (El-Furqa), Filistin, El-Dawar, û El-Hada) de xêzîyê xwe di xêzîyê şerî de xêzîyê xwe ji xêzîyê Filistinî de dîr xwendinê bilind.

Sala 1954-ê jî bo karê xwe xwendinê xwe di xêzîyê şerî de dîr xwendinê bilind. Xessan Kenefani xêzîyê xwe di xêzîyê şerî de xêzîyê xwe ji xêzîyê Filistinî de dîr xwendinê bilind.

24 Tîrmeha 1972-an rojanê wî jî di xêzîyê şerî de hatin xwendin. Xessan Kenefani xêzîyê xwe di xêzîyê şerî de xêzîyê xwe ji xêzîyê Filistinî de dîr xwendinê bilind.

Di fîyana xwe ya herî dawî Xessan Kenefani çar xêzîyê xwe di xêzîyê şerî de xêzîyê xwe ji xêzîyê Filistinî de dîr xwendinê bilind.

Berî bigehe jor, li gavka dawîyê rawesta, da bêhna xwe bide... Ne, nabe hind yê mandî be... Ew bi xwe jî dizane ne hindyê mandî ye... Li ber derîyê hotêlê ji otombîlê peya bûye, paş çî tişteke wê nîne ji bilî selkeka destî ya biçûk û gavikê jî di bilind ne bûn her wekî wî hizir kirî... Lê ev her sê gavikên dawîyêne her dem piştî wî dişkenin, çokên wî di xêzîyê şerî û wêna wî di xêzîyê şerî... Selka xwe dana erdî û milê xwe da dîwarî... Erê carekê din paşve vegere? Ev pîrsiyare seyr dihat pêş çavan, lê nedikarî xwe jê qurtal bike; mîna zengilekî mezin di serî de deng dida... Erê bizivirim? Di navê wê dudîlyayê ketî di reh û demarên wî de ji nişkave hat birê ku berî du salan wek niha li vêrê rawestiyabû û her ev pîrsiyar bû ji xwe dikir. Hingê vegerîya, li otombîlê siwar bû û Qudsê hêla... Niha carekê din we bike? Lepê xwe dirêj kir selkê, bi tundi destikê wê girt û her wekî xwe ji goleka kurê hilkişandî ber bi jor çû.

Ne! wê careê venagerim! Şerm e bo min, ez hind mirovekê tirsinok bim... Ev bi dirêjahîya deh salan e barekê giran min xistîye ser milên xwe... Niha li ber dergehê (Mendilbom) divê bişûm, ew dergehê bilind dibe, dibe sinorê di navbera xakê dagîrkirî û yê mayî... Ne, evê careê nazivirim... Divê sinorekê bo wê derewê danim. Ev derewa dirêj ya hinde sal in min bi kar anî, çî ji dil û çî ne ji dil, nizanim, bi dirêjahîya deh salan... Berî du salan, dema gihîştîye Qudsê, bîrbara xwe dabû ku dayîka xwe bibîne û berka xwe jê re daqute û her tiştî jê ra bibêje... Lê dema li ser gavikên hotêlê rawestayî, pê zanî ku nikare wê derewa dirêj, ya deh salan li ser dayîka xwe bîrandî, dema dengê xwe di istgehê ra dişand û digot: "Ez û Delal di baş in, hûn jî dilê me tena kin...", spî bike û nehêle, ew derewa sal bo salê û bi dirêjahîya deh salan şîna bûyî, pîs mezîna dibe, ta ku nema divê carekê bi tinê jî rastîyê bêje, راستiya tal û dijwar, dibe jî ya kujek be... Ji ber hindê wê rojê zanî baştir e êdî bi ser gavkanê nekeve û vegere... Paş raste jî ku dayîka wî, wê spêdê hemûyê di derazînka dergehî da rawestiyaye, stûyê xwe dirêj kirîye û di nav xelkî da li dêmê wî gerîyaye... Dîsa wî bawere jî ku ew dilşkestî û bê hîvî bûye... Lê ew hemû gelek bi sanahîtir e ji hindê ku rû bi rû li beramber wê raweste, li wêrê, piştî deh salan, da راستiya kujekê jê ra bêje...

Li ser textê xwe pal da û destên xwe xistin bin serê xwe... Tarîyê destê pê dikir, perda xwe ya reş bi ser bajarê ketî xewê da digirt. Tişteke di odê ve nebû, tinê hizrekê nebûn; sibe divê biçîte Mendilbom!... Sibe lepê xwe yê xuhdayî dê jê ra hejînit û bi pirça xwe ya spî û dêmê xwe yê

qurmiçî û ter ji rondikan dê xwe havêtê û hembêz ketin, rondikên wê dê kevin ser singê wî û dê velerzît mîna çûçkekê di berberka mirinê da, dê serê xwe yê bi êş û jan di rûyê wî hisîtin, bêyî wê peyvê bibîne ya ku bikare vîyana dilê xwe pê darêje... Çi bibêje, gava diya wî mîna dilê di singê wî de xwe diqute, li ser singê wî vedilerze? Divê ji kû dest pê bike? Di nav cihê xwe da xwe wergerand û hizir kir ku qutquta dilê wî gişt leşê wî yê vegirtî, mîna dezîyê ji her du aliyan girêdayî, dilerize. Dê ji serî dest pê bike, dema xatira xwe ji "Yafa" yê xwestî û ber bi "Ekka" yê ve çûyî da wî keşika diya wî diviya jê ra bixwaze, bibîne: Ev dem baş li bîra wi ye, çawa diya wî li ser payiskê (pêstirkê-merdiwen) rawestayî bû û daxwaza silametî û serkeftinê jê ra dikir, xaleta (xuşkeda) wî ji bi tenişt ve rawestayîbû û destê xwe bo dihejand. Ew dizane ku dê li dev diya wî bimîne, ta ku vedigere ve. Bi germî destê xuşka xwe Delalê, ya ku dixwest pê ra biçît, girtibû, keçeke ter, ya deh salî ku yekemîn car e di jiyana xwe de ji malê, bi birayê xwe ra derdikeve.

Lê ew bûyerên rûdane ne ew bûn yên ku wî û wê dixwestin.

Bi çend rojan piştî ku ji Yafayê derketin, rê hat girtin, nekarin vegezin. Wan rojên reş yên dûrî diya xwe bûrandin, gelek nexweşî kul û kovan kêşan. Ne ji ber xwe, lê ji ber xuşka xwe Delalê ya ku hemû tişt bû ji diya xwe re. Ewe mînaka jîyanê li pêş çavên pîredayka xwe, dema mirin nêzik dibe, ewe gişt jîyan, dema tev tişt dibin mirin.

Ne... Ev parçe ji çfroke ji dayika wî ra ne giring e, bê guman ew dixwaze tiştên aloztir û şêltir ji vê parça çiprokê bizane.

Careka din xwe di nav cihê xwe da wergerand, bêyî ku bizane çî bike. Sinahiyek bê serûber di odi ve hebû, selka biçûk ji wek tişteki bi ruh pala xwe dabû diwarî. Çima çfroke ji serî dest pê nake ta dawîye? Çima jê ra nabêje çawa Cuhî daketin Ekkayê û ka piştî hingê çî rû da?... Di hundir de bû, dema dozex bi ser û çavan veteqiyayî... Paşde çû, di gel ewên paş de ketin, dema tariyê bajarê Ekka vedipêça, tivenga wî ya kurt her tiştê tê da hilavêt û bi tinê ma darek, darekê hişk, bi kêr çî neyê... Çû di oda xwe ve û destê xwe li stoyê Delalê werand, Delal, li jêr wê schma bi ser bajarî dagirtî, digirtî... Berî wan ageh ji xwe hebe, di derî da mil ketibûn ber hev û lûliya tivengeka pîrbêj hat vekirin, wek baranê gulle li ode barandin, di nav dükêlê ra çar zelum di derê ode da diyar bûn. Lê nelivî, Delal di xwîna xwe digevizi û li ber mirinê bû.

Da ber singê xwe, givaşt her weku dixwest dil û xwîna xwe biditê, hev kire birayê xwe, birûyên xwe livandin da ku tişteki ji birayê xwe re bêje, lê mirinê rê li peyvên wê girt.

Erê girî? Niha çî li birê nemaye; tiştê li birê mayî, xuşka xwe ya kuştî dana ser destên xwe û ji hundir derket. Bilind dikir li pêş çavên rêbara, rondik ji wan dixwestin her weki rondikên wî bi tinê têr nedikirin. Nizane xelkî kengê ew leşê mirî ji nav lepên wî derxist, lê dizane dema xuşka wî ya mirî ji nav desta çûyî, dema leşê wê yê sar û hişk wînda kirî, hizir kir ku her tişt bi dawî hatî axa wî, kes û karên wî, hêviya wî, êdî nema jê ra xeme, eger xwe jiyana wî bi xwe jî bi dawî bê.

Ji vêrê û pê da êdî bû mêvanê çiya, erdê xwe hêla û ji qedere revî, ew qedera wek qamçiyekê bi dû ve.

Eger ev gişt ji dayika xwe re bigota, nûke ew derewa mezin ya deh salan avakirî nedima, hingê dayika wî wê bizaniba ku Delal berî deh salan miriyê û kurê wê derew di gel dikirin, dema axaftina xwe ya sar di istgehê da dubare dikir: "Ez û Delal di baş in, hûn jî dilê me tena kin..."

Rabû, çû ber pencerê, perdên reş vedan û li rê mêze kir. Divê diya xwe ji vê derewê û xwe jî ji qedera reş ya ku ew bi tinê, hêlaye rizgar bike, divê jê ra bêje ku Delal li wir hatiye veşartin û kesek nîne li cejn û sersala qevdikên gula bibe ser gora wê ya biçûk û dayika wê ya ku çend bihosteka ji wê gora xweştîvî dîr, nikare sera bide.

## 2

Dîdar roja di bû...Berî spêdê li ber siha dergehê mezin.

Eli dema li xelkî mêze kir, dayika xwe nedît, bi tinê xaleta wî li wêrê bû, cara yekê nas nekir, lê ewê ew nas kir û karî riya cihê xwe nîşa wî bide.

Li dîtinê xaleta wî ew pirs jê kir ya ku bi taybetî ji bo bersivdana wê hatî:

- Kanî Delal?

Di her du çavên wê yên biçûk da gişt xweragirtina bi xwe ra anî, bihujî, her weki hêzeka nepen xwe bi qirka wî ve girtî û bê rawestan dihejine:

-Lê te negot ka dayika min? Û carek din çavên wan li hev ketin, Eli selik ji vî destî veguhast destê dî, bizav kir tişteki bêje, lê gewriya wî mîna xencereka serçemandî bi kelegirtiyek pil, girtî bû.

Xaleta wî destê xwe dirêj kir, dana ser milê wî û dengê wê yê ji êş û jana dagirti, hat guhên wî:

-Kani Delal?

-Delal ?? Û careka din hest kir ku lawazî ya çûkên wî dixwitin, hizir kir ku dê kevit û hişyar nabit. Lê bizav kir û xweragirt; destê xwe bilind kir û selik bi nik xaleta xwe ve dirêj kir:

-Vê selikê bigre û ji diya min ra bibe, hindek behîvterk tê da ne... Û nekarî axaftina xwe bi dawî bîne, nêrînek pir bi kovan ji çavên pîrejîne hat darêtin. Lêva Eli lerizî, wî hev kirê û bi dengêki lawaz, axaftina xwe berdeyam kir:

...Ji behîvan hez dikir. Û di wê bédengîya bê sînor ya wek gorekê di navbera wan da vebûyî, hest pê kir ku vîyaneka pir mezin ber bi bazdanê ve wî pal dide û xaleta wî tiliyên xwe di çenta biçûk ya kirasê kesekê Delalê tê da digerlandin... Tişteki bi tinê xwe di singê her dûyan de dihilavêt. Yek rawestiyayî û rondikên bédeng di çavan de diteyisin û yê din hest dike ku xencera serçirîsî gewriya wî birindar dike.... Destê xwe dirêj kir û rûyê wê bi nik xwe ve bilind kir, paş xwe ji hindê bi pirsîyareka vemirî û sar paş da bir:

-Te çawa Yafa hêla?

Xelate wî bizav kir ku tişteki jê ra bêje, lê nekarî, coyên peyva di gewriyê da mil bi mil vena. Îna bédeng ma, paş girniji; girnijînek zer û hişk, ya bê raman... Bi dilovanîyeka birindar destê xwe yê velerzok dirêj kir, dana ser milê wî, lê ewî pir bi bédengî çavê xwe li pişta dergehê (Mendîlbom) digerland.

Kuwêt 1985

Wergêr: Îmad Cemil

# DI KURMACÎYA JORÎ DE DEVOKA BEHDÎNÎ

---

S. Rêving

---

Ez nîzanim mirov dikare li ser "hejmara devokan" an "ji aliyê devokan ve" li ser "perçebûna" zimanekê bipeyive an ne, belê zimanê kurdî yek ji wan zimanên xwedîyê "pirzarav" û pirdevok" an e. Pir an hindik piraniya kurdan lê rast hatine; gava kurdek li gundekî dût an li cihne din dibe mêvan, bêyî ku çêlî devera xwe bike an navê gundê xwe bibêje, guhdar ji devoka wî dizanin, ka ew ji kû ye, ji kîjan deverê ye û heta ji kîjan eşîrê ye jî. Bo nimûne yekî Goyî an yekî Cizîra Bota li kû be bila bibe bi hêsani mirov dikare ji devoka wî, wî nas bike. Mane gelek cara demê kurdên ji herêmên cihê an ji perçên cihê li ba hev rûdinin, bi henekî jî be, dibêjin: "Bira, divê tercimanek hebe, heta ku em bikarin zimanê hev dûtê bigihin. Jixwe pîrbûna hevokên me welê kirîye, heta ku metelok û pêkenînên li ser devok an peyvan jî bikevin nav kultûra me.

Her çiqas ji aliyê gramatika zimanekê de ferqên wiha pir mezin di navbera devokan de nebin jî, mirov dikare bibêje, di zimanê kurdî de devoka Behdîni ji vê qeydê dût ketiye. Gava mirov devoka Behdîni û devokên din yê Kurmancîya jorî yan jî Behdîni û bi giştî Kurmancîya jorî ya li Kurdistanê bakur û rojava têt peyivîn dide berhev, dibîne ku çî ji aliyê gramatikê û çî ji aliyê fonetikê ve be, ferqên di navbera wan de mestir in ji yê di navbera devokên zimanekê de. Jixwe çî bi xwendina berhemên edebî yê "Behdîni" û çî di danûstandinên jiyana rojane de be, mirov bi hêsani bi van ferqan dihesê.

Di vê nivîsarê de ez dixwazim -eger hinek me'lûmatên pêşî jî bin- li ser devoka Behdîni çend peyva bikim.

Li gor hinek belgên dirokî; navê vê devokê ji mîrnişîna Behdînan hatiye. Mele Enwerê Mayî idîa dike ku mîrnişîna Behdînan li devera Berwarî hatiye damezrandin û paytextê wê jî Amêdiyê bûye. Ew dibêje ku navê mîrê vê mîrnişînê "Bahaedîn" bû û her ev nav li mîrnişînê bi xwe jî hat kirin.(1)

Belê, eger di destpêkê de sînorên Behdînan bi tenê Amêdiyê û hawîr dora wê dabe ber xwe jî, bere-bere ev sînor "firehtir" bûne û îro li Kurdistanê başûr hemû deverên ku xelkê wan bi Kurmancîya jorî dipeyivin ji mintîqa Behdînan tèn hesêbkirin û hemû eşîrên ku bi Kurmancîya jorî dipeyivin bi "Behdîni", "Badîni" yê tèn nasin û ew diyalakta- Kurmancîya jorî- li devera

Behdînan têt peyivîn bi "Badîni", "Behdîni" yê têt navkirin. Jixwe heta îro jî, li Kurdistanê başûr, xelk ji Kurmancîya jorî re "Behdîni" û ji Kurmancîya jorî re "Sorani" dibêjin. Her wiha, ew kurdê bi Kurmancîya jorî dipeyive "Badîni"yê û yê bi Kurmancîya jorî dipeyive "Sora" ye.

Li gor "sînorên" îro bajarên dikevin ber devera Behdînan û eşîrên bi "Behdîni" dipeyivin eve ne:

## Bajar:

Dihok  
Zaxo  
Akrêy  
Şingar  
Sêmêl  
Mintîqa Zimar  
Amêdiyê

## Eşîr:

Herkî  
Goran  
Sûricî  
Rêkani  
Nêrweyi  
Berwarî  
Bîradostî  
Doskî

Mizûri  
Berwarî  
Sindi  
Gulî  
Silevaneyî  
Mîran  
Kiki  
Milî

Eşîrên li Şingarê û giştî Yezîdiyên li Kurdistanê başûr. Ji bo ku têgihîştina wê hêsantir be, min devoke Behdîni û bi giştî Kurmancîya jorî, bend-bend û bi hinek nimûnên rojane dan berhev:

## 1-Tewanga navdêrên nêr:

Wek Celadet Elî Bedirxan dibêje; di Kurmancîya jorî de "Navdêr hevenav bin, serenav bin, li gora mêjer û zayendên xwe têne tewandin. Bi gelemperi (min reş kir. S.R.) û di yekejmariyê de navdêrên nêr bi "î" yê û navdêrên mê bi "ê" yê û gelemmara her du navdêran bi "an" ê têne tewandin."(2)

"Me goti bû ko "o" û "ê" tewangên bankirinê ne. Lê carina van tewangan li şûna tewangên adetî jî dixebitînin. Mesela em navê "Mîş" bigrin. Ev navê he navekî mêran e, ji lewra diviya bû bi "î" bihata tewandin û li gor qeyda gelemper (S.R.) diviya bû mirov bibêje: "Mîş hat, Mîşî got, Mîşo were". Lê herwekî me got, "o" yê dixin şûna "î"

yê û dibêjin "Mîş hat, Mîşo got, Mîşo were".(3)

"Ez Memî dibînim

Mem Zînê dibîne

Memî Zîn dît."(4) Kamûran Bedirxan dibêje:

"Di zimanê kurdî de daçekên tewangê; ji bo navdêrên nêr "î" ji bo yên mê "ê" û ji bo gelemjara her du zayendan "an" e".(5)

Ji van nimûnên jorî jî xuya dibe ku wek qeyda gelemper, wek qeyda giştî, di zimanê kurdî de navdêrên nêr, çî ji aliyê navekî din ve bîen tefsîrkirin, çî li pêşya daçekekê bîen, çî di wextên bûrî yên lêkerên transîtîv de subjekt bin û çî di wextê niha û yê misteqbel yên lêkerên transîtîv de objekt bin, bi "î" yê tîen tewandin. Belê wek Celadet Bedirxanî jî îşaret kirî, li hinek deverên Kurdistanê, Kurd eger di wan de "a" yek hebe, navdêrên nêr bi "ê" yekê jî tîen tewandin. Û eger "a" yek di wan de nebe, bingê ew navdêrê nêr bê tewang dimîne.

Di Behdînî de navdêrên nêr, di hevokê de çî wezîfê bigrin bila bigrin, bi "î" yê tîen tewandin. Tewandina bi "ê" yê di Behdînî de nîne û her wiha jî navdêrê nêr çî cara bê tewang namîne. Mirov dikare bibêje, di vî warî de "Behdînî" jî kurdên din mihafazakartir in. Eve ne çend hevokên bi Behdînî:

Kurê Lezgînî çû.

Min ji Lezgînî re nameyek şand.

Lezgînî xwarin xwar.

Lezgîn goştî dixwe.

Bi ya min, her çiqas li hinek cihên Kurdistanê meyla zimanê kurdî ber bi terikandina tewanga navdêrên nêr ve ji be, bêtewangmana navdêrên nêr tesîreke negatîf li me'na hevokê jî dike. Bo nimûne em hevoka "Şivan li bilûrê xist" bigrin. Ji ber ku "Lê xistin" lê kereke transîtîv e û wext wextê bûrîye, li gor qeyda giştî, divê subjekt bê tewandin. Eger neyê tewandin me'na hevokê têt gûhûrîn. Mirov vê hevokê li devera Behdînan an li hinek deverên Kurdistanê bakur bibêje wê wilo têt bigihin ku yekî an "dêwekî", "Şêrekî" rahiştîye Şivanî û ew li "nav çavên" bilûrê xistîye. Eger ev hevok bi awayê: "Şivanî li bilûrê xist," "Şivên li bilûrê xist" bêt gotin, hingê ew gûhûrîn di hevokê de çê nabe. An hevoka "Lezgîn xwar." Di vir de jî eger "Lezgîn" subjekt be -ku mebest ew e- bê tewangmana "wî" me'na hevokê digûhûre. Mirov wilo têt digihe ku: yekî Lezgîn xwarîye. Anku Lezgîn hatîye xwarin, ne ku wî tiştê xwarîye. Bi gotineke din, di van her du hevokên jorî de "Şivan" û "Lezgîn" dibin objekt ne ku subjekt. Çînkî li gor qeyda giştî ya kurmançiya jorî; Eger navdêr di wextê niha û yê misteqbel yên hemû lêkeran de, û di wextên bûrî yên lêkerên intransîtîv de subjekt be nayê tewandin. Û eger navdêr di wextên bûrî yên lêkerên transîtîv de subjekt be, têt tewandin, eger objekt be, nayê tewandin.

Di vî warî de ferqêke din jî ya Behdînî ew e ku; navên mêran yên bi "o" yekê jî xilas dibin, bi "î" yê tîene tewandin. Di vir de Behdînî nakeve ber wê qeyda ku Celadet Bedirxanî li dûv gotina xwe ya li ser tewandina navên mêran yên bi "o" yê diqedin çêl kirîye: (-Wek netîceke vê qeydê, navên ko bi "o" yê diqedin bi tu awayî nayîne tewandin. Ji lewre mirov dikare bibêje: "Bozên got", lê nikare bibêje: "Hêco got". Divêt bibêje "Heco got". Ji ber ku navê "Heco" bi "o" yê tamam dibe) (6). Di Behdînî de navên bi "o" yê jî tamam dibin bi "î" yê tîene tewandin:

"Hacoyî got" "Min ji Samoyî re kitêbek anî"

"Ez Reşoyî dibînim" "Mistoyî nameyek nivîsî".

Li dawîya vê bendê, ez dixwazim bibêjim ku demê Qenatê Kurdo di wextên bûrî yên lêkerên transîtîv de behsa tewanga subjektên "nêr" dike, bi tenê tewanga veqetandekên ne bi navkirî bi kar tîne: "Forma çivane ya kiryarê esli jin "ê" têt gotinê, lê forma çivane ya kiryarê esli mêr têt gotinê "î" (eger kiryar bi paşkoka "ek" va be" (7)

## 2-Veqetandekên nebinavkirî:

Bi giştî di Kurmançiya jorî de veqetandekên nebinavkirî, yên navdêrên ku di haletê îzafetê de ne an jî rengdêrekê daye pey wan; ji bo yekejmara zayendê nêr "ekî", ji bo yekejmara zayendê mê "eke" û ji bo gelemjara her du zayendan "ine" ye:

"Karekî Baş", "Qîzeqe spehî."

"Hespîne delal

Belê di Behdînî de ev veqetandekên nebinavkirî ji bilî paşkoka "ek"- her wek veqetandekên binavkirî ne:

Karekê baş, Keçeka ciwan.

Hin hespên delal.

## 3-Demê pêşerojê:

Wek têt zanîn, di Kurmançiya jorî de ji bilî lêkerên ji pêşkokên "va", "ra", "hil", "da" u.h.d. û ji lêkerekê besît pêktên, di wextê pêşerojê yên hemû lêkeran de pêspirtika "bi" yê bi koka lêkerê ve dibe:

Ez ê xwarinê bixwim.

Ez ê nameyekê binivîsim.

Di Behdînî de ev pêspiratika "bi" yê, di wextê pêşerojê de tuneye û bi koka lêkere ve nabe:

Ez dê xwarinê xwim.

Ez dê nameyekê nivîsim.

## 4-Demê bûrî yê şertî:

Ez dikarim bibêjim eve mestirîn ferq e ku di Behdînyê de mirov lê rast têt. Çînkî li gor qeyda tevayî, di Kurmançiya jorî de "pronavên bingehîn" (ez- tu-ew -em

-hûn -ew) di hemû wextên lêkerên intransîtîv û wextê niha û yê misteqbel yên lêkerên transîtîv de dibin subjektên lêkeran. Û "pronavên tewandî" (min -te-wî -wê-me- we-wan) jî di wextê niha û yê misteqbel, yên lêkerên transîtîv de dibin objekt. Vajîya vê, di hemû wextên bûrî yên lêkerên transîtîv de, "pronavên tewandî" dibin subjekt û yên "bingehîn" di şûna wan de dibin objekt. Lewra, divê di wextê bûrî yê şertî yê lêkerê transîtîv de subjektê lêkerê pronavekî tewandî û objekt jî pronavekî bingehîn be Wek:

Min ê tu biditibiwa, eger wextê min hebiwa.

Min ê tu banîba, eger qelenê te ne giran biwa.

Lê di Behdîni de, ev wextê lêkerên transîtîv dijî qeyda gelemper a kurmançîya jorî ye.

Ez da te bînim, eger wextê min heba

Ez da te înim, eger qelenê te ne giran ba.

Weke ku mirov dibîne di şûna "Pronavên tewandî" de, "pronavên bingehîn di Behdîniyê de bi kar tên û lewra jî paşkoka "im" ya ser bi pronavî ve li paşîya lêkeran cih digre. Her wiha ew pirtika "ê" ya ku di wextê bûrî yê şertî de piştî pronavan têt, di Behdîniyê de dibe "da". Dibe ku ev "da" ya henê welê dike ku "ez" şûna "min" ê bigre û ev formê dijî qeyda gelemper peyda bibe. Û tişteki din yê balkêş, di kurmançîya jorî de formê negatîf yê vî wextî heye, lê di Behdîni de tune:

Di Kurmançîya jorî de

"Minê nexwaribiwa, eger şîva we ne masî biwana"

Gava kurdên "Behdîni" formê negatîf yê vî wextî dibêjin, her formê demê "bûrî yê çîrokî" bi kar înin:

"Min nedixwar, eger şîva we ne masî bana."

## 5-Pirtika "di"

Gava Celadet Elî Bedirxan li ser veqetandekên binavkirî dipeyive, di derbarê vê pirtikê de wiha dibêje: "...Herwekî pêşdetir dê bête gotin "yê, ya yên" pronavine îşarkî ne û veqetandekên me ên binavkirî jî wan hatine pê. Di esl û bingehî de gava ev pronav diketin pêşîya navdêrekê û dibûn rengdêrine îşarkî "di" yek diket navbera wan û navdêrê. Mesela gotina "Hespê Soro" di eslê xwe de "Hespê di Soro ye. Ev şikil hetanî îro di hin cihên Kurdistanê de peyda dibe. Lê bi tenê di gelemperê de tete gotin. Yanî li şûna ko bibêjin "Hespên Soro", "Hespê di Soro" dibêjin û gelemperîya hespan bi "di" yê didin zanîn."(8)

Di Behdîniyê de ev pirtik heta niha jî maye û her wek Celadetî gotî, gelemperîya pronavan nîşan dide. Lê bi ferqekê ku; bi piranî eger di cimlê de sîfet an haletê pronavina bên dîyar kirin:

Em di bîrsî ne.

Şevê havîna di kurt in.

Gul di sor in.

Dibe ku ew formê Celadet çêl dike- "Di esl û bingehî de gava ev pronav diketin pêşîya navdêrekê û dibûn rengdêrine îşarkî "di" yek diket navbera wan û navdêrê"- li devera Behdîna bi awayekî din serketina xwe temam kiribe û formê gelemper (êd-êt) ê navdêran jê zabe. Ew di mîsalên serketina veqetandekên kurmançî de wiha dibêje:

Ev hespê di Soro ne.

Ev hespên di Soro ne.

Ev hespên Soro ne.

Baş xuya ye veqetandeka "yên" serî jî "di" yê standîye û bere-bere ev pirtik wînda bûye. Wek tê zanîn di Behdîniyê de formê gelemperîya navdêran (êt-êd): "Hespê Soro". "Kitêbê min". Dibe ku vajîya mîsala jorî di vir de bi cih hatîye û pirtika "di" serî jî "yên" ê standîye. Û formê gelemper ê navdêran hatîye pê:

Hespê di Soro

Hespêd Soro

Hespêt Soro

## 6-Veqetandeka ku zayendê subjektê nîşan dike:

Di formê yekejmar yê Behdîni de, veqetandeka zayenda subjektê nîşan dide, her bi subjektê re tê gotin û dikeve navbera subjekt û navdêr an rengdêran de:

Ez yê bîrsî me (Eger subjekt nêr be)

Ez ya bîrsî me (Eger subjekt mê be.)

## 7-Lêkera "Heyîn":

Di Behdîni de formê wextê niha yê vê lêkerê cihêtir e jî formê Kurmançîya jorî:

Di Kurmançîya jorî de;

Yekejmar: "Min kurek heye" an "Kurekî min heye"

Gelemper: "Min du kur hene" an "Du kurên min hene."

Di Behdîni de;

Yekejmara zayendê nêr: "Min kurekê heyî"

Yekejmara zayendê mê: "Min keçekê heyî"

Gelemper her du zayendan: "Min du kurêt heyin"

Wek mirov dibîne, di formê yekejmariya vê lêkerê de veqetandeka nêr û mêyatiya objektê xuyadike, di navbera objekt û lêkerê de cî digre. Formê gelemperê jî tevî ku di dawîya lêkerê de hatîye diyarkirin, lê piştî objektê jî pirtika gelemperîyê (êt) her têt gotin.

Di kêşana lêkerê bi xwe de jî "e", "û", "ne" radibin û "î" û "în" dikevin şûna wan.

**8-"Wextê bûrî yê dûr" an "Boriya dûdar"** Di formê vî wextî de jî Behdîni her veqetandeka zayende û mêjera objektê xuya dikin:

Di Kurmançîya jorî de:

Min sêvek xwarîye

Min du sêv xwarine

Di Behdîni de,

Yekjmara zayendê nêr: Min nanek yê xwarî

Yekejmara zayendê mê: Min sêvek ya xwarî

Geljmara her du zayendan: Min du sêvêt (yêt) xwarîn.

### 9-Daçekê "bo" ya îtîcahê an tevgerê:

Gelek caran ji nimûnên rojane jî mirov dertêxe, gava Kurd di cimlekê de îtîcahekê, cihekê xuya dikin navdêrê ditewînin bêyî ku qayîdeke tewangê bi kar binin. Bi piranî bo nimûne di cimla jêrî de. "Amûd" hatiye tewandin, lê ne subjekt û ne objekt e û ne jî ji aliyê navekî din de hatiye nimandin.

Ez diçim Amûdê.

Ew ji wir hat Cizîrê

Li piraniya deverên Behdînan gava ew lêkerên îtîcahekê, cihekê nişan dikin an jî bo tevgerê bi kar tên "bo" yek dikeve pêşya navdêran û wan ditewîne:

Ez diçim bo Dihokê

Ez ji wir hatim bo Şingarê.

### 10-"Divêtin", "Herin" û "Bi kuştin dan":

Bi piranî di Kurmanciya jorî de mesderên "Divêtin" û "Herin" di şûna "Çûn" û "Viyan" ê de bi kar tên. Eger we bala xwe dabiyê kurdên ku "Herin"ê bi kar tînin bi tenê formê wextê niha û yê misteqbel yê vê lêkerê dibêjin: "Ez derim". "Ezê herim". Gava wextên bûrî bi kar tên, her dişa vedigerin ser "Çûn"ê:

"Ez çûm". "Ez çûbûm".

Awayên pêşî nêzikatî li mesderên "Ruştin" a bi kurmanciya jêrî û "Reftin" a bi farisi dikin. Dibe ku ji wir jî hatibin.

"Bi kuştin dan" di Behdîni de bi awayê "Dan kuştin"ê de ye Daçekê "bi" tune ye û "dan" jî berî "kuştin" ê tê gotin.

### 11-Pirtika "ve":

Ev pirtika "ve" di Behdîni de bi rolekî taybetî radişe û me'na dubarekirina, tekrarkirina karekê nişan dide:

Di behdîni de:

Ez dê çime ve.

Min jê re gote ve

Di kurmanciya jorî de:

Ezê car din (dîsan) biçim. Min dîsan (car din) jê re got.

Ev paşpirtik bi dawîya lêkeran ve dizeliqe û "e" yek dikeve navbera lêker û "ve" yê de.

### 12-Ji bilî van ferqan, fonetîka Behdîniyê yek ji wan

xisûsiyetên xuya, ya vê devokê ye ku bi hesanî mirov yekî Behdîni pê nas dike.

**a-**Behdîni dengê "o" yê wek kurmancên din bi lêv nakin. "O" ya wan dirêjtir e û mirov dikare bibêje "û" ya kurdên bakur e:

Li Kurdistana Bakur:

Sor  
Kolan  
Bozê  
Goristan  
Por

Li Behdînan

Sûr  
Kûlan  
Bûzê  
Gûristan  
Pûr.

**b-**Dîsan dengê tîpa "û" yê li Behdînan kurtir û nêzikî dengê "û" ya tirkî an "u" ya Swêdî ye:

Li Kurdistana bakur

Bûk  
Kûr  
Çûk  
Sûk  
Dûr

Li Behdînan

"Bwîk"  
"Kwîr"  
"Çwîk"  
"Swîk"  
"Swîr"

**c-**Di tesrîfa hinek lêkeran de jî nemaze ji bo kesê siyem fonetîka wan cidatir e ji ya kurmancên bakur.

Li Kurdistana bakur.

Ew xwarinê dixwe  
Ew diçe  
Em dikin  
Em dibêjin.

Li Behdînan

Ew xwarinê dixwit  
Ew diçit (Ew diçit)  
Em dikeyn (Em dikîn)  
Em dibêjin.

Piştî lêkolîneke têkûz, dibe ku mirov pêrgî hinek ferq û cuhahiyên din jî bê.

Min bihîstîye ku Sadiq Bahadî Amêdî li ser gramera Kurmanciya jorî xebitîye. Belê mixabin encama xabata wî heta niha jî nehatiye çapkirin. Her wiha weke xwendevan jî dizanin, her çiqas li Kurdistana başûr berhemine hêja yê edebî, kulturî an yê li ser zimanê kurdî çap bibin jî; ji ber ku bi tîpên erebî hatine nivîsandin, bi giştî kurdên Kurdistana bakur nikarin bixwînin.

Belê tiştê mirov dibîne; tevî ku Kurmanciya kurdên li devera Hekkarî û Botan nêzikî Behdîniyê jî be, lê ez bawer nakim tu devokên din wek Behdîniyê jî

Kurmanciya jorî dîr ketibe. Bê guman eger sedemên vê dîrketinê babetê lêkolînan jî be, mirov dikare bibêje perçebûna welatê me û berdewambûna vê rewşê sedemeke girîng e û wê her tesîra xwe ya negatîf bidomîne.

### Serçaweyê:

- 1- Mele Enwerê Mayî. "El-Ekrad fi Behdînan- (Kurd li Behdînan)
- 2- Hawar Hij: 32 rûp. 9
- 3- Hawar Hij. 31 Rûp. 9
- 4- Hawar Hij. 25 Rûp 16 (Beşê Frensî)

Lê, dîsan jî xebata "Zîmanê Yekgirtî yê Kurdî yê Edebî" dikare rola xwe ya pozîtîf bilîze û heta berî rizgariya Kurdistanê jî gelek problemên li pêş zîmanê me çareser bike.

- 5- Kamûran Bedirxan. Bi ravekirina Tirkî, Gramera Kurdî (Türkçe izahlî Kürtçe Gramer) Rûp.17
- 6- Hawar Hij: 31 Rûp: 9
- 7- Qanatê Kurdo; Zimana Kurdî, Rêzîman Rûp.174
- 8- Hawar Hij. 34 Rûp. 16

## AGAHDARÎ

**Komela Kurd li Stockholmê,  
du semîner û rojekê xwendina şîran  
amade dike.**

1-Di roja 23.4.1988, seet 14:00'an de nivîskarê kurd **Malmîsanij** semînerê li ser "Tarîxa sirgûnbûna kurda li Kurdistana Bakur" pêşkeş dike.

Cî: Brygghuset  
Norrullsgatan 12  
T-Odenplan

2-Di roja 08.05.1988, seet 14:00'de **11 şairên kurd ên li Swêdê dijîn**, çend şîrên xwe bixînin. Şairên ku di vê rojê de beşdar bin ev in:

- 1-Mueyed Teyeb,
- 2-Hemê Saîd Hesên,
- 3-Xelîl Dihokî,

- 4-Asî Rebatî
- 5-Mehfûz Mayî,
- 6-Silêmanî Qasimyanî,
- 7-Rizgar Ebdulah
- 8-Malmîsanij,
- 9-Alan Serdeştî,
- 10-Emîn Sindî
- 11-Azad

Cî: Husbytraff  
T-bana Husby

3-Di roja 14.05.1988 seet: 14.00'an de heval **Faxreddîn Gerdî**, lêkolîna xwe ya li ser "Folklor û Stranên kurdî" wekê semînerê pêşkeş dike.

Cî: Brygghuset  
Norrullsgatan 12  
T-bana Odenplan

### Agahdariyek bo Kurdên li Swêdê

Her kesê ku dixwaze materyalên Enstîtuya Kurdî ya Parîsê bi dest xwe xe, an jî derheqê Enstîtuyê de agahdariyan bistîne û bixwaze bibe endam, li Swêdê dikarin serî li vê adresa jêrîn xin.

**Lutfî Baksî**

**Endamê Heyeta Îdarî ya Enstîtuya  
Kurdî ya Parîsê.**

Adres: Risingeplan 21 Bv 163 62 Spånga Tel:08/7615704.



## KURDEKÎ SWÊDÎ JÎ XELATEKE YEKEMÎN WERGIRT

Rûniştvanên Swêdê, di navbera demekê û demekê de mûsabaqan li dar dixînin. Ev mûsabeqe wilo renga-reng e û pirin, heya mirov nagihê haziriya xwe bike. Bi xwe herçî em kurd "haziriya di wextê oc" ji me kême. Ji ber vê çendê tim û tim em ji hemû qad û maqaman li pey xelkê dimînin û destvala ji cengan dertên. Leyse, de emê dûr neçin û emê li têma xwe wegerin.

Di warê mûsabaqa spehîbûna jinan de em jê bê par in, çimkî rişma kehêla kurd hûn di destê siwarê wê de ye, tevî ku carna ew xwe şemûs dike û lotika dide, da ku barê xwe li ser milê xwe bavêje, lê siwar her li ser a xwe dimîne û hevsarê kehêla xwe sist nake û heya carna berê xwe dide qeyd û merbetan.

Her çî mûsabaqa zilamên seksî (seyr nemînin tiştê waha jî li vî welatî li dar dixînin), li gel ku ev cirfda me ye jî, lê me xwe jê dûr xist ji ber a parastina heyvanê bav û kalan.

Lê mûsabaqa dirêjbûna simbêlan; li gora adetên me, gerek em ê yekemîn bana. Lê me xwe li ber Ewrûpiya kême nekir; xortên me yan simbêlên xwe sivik kirin an jî ji binî rakirin û bi vî hawayî ev xelata ha jî ji destê me çû.

Dibe ku hinek ji we û bi taybetî kesên li welat, bipirsin; çî bi strana kurdî hat? Ma dengbêjên me Şivan, Şîrinê û Rezazî kuliyan devê wan xwarine?

Na heyran, na. Kuliyan devê wan nexwarine û bila dilê we di cî de be. Hema berî demekê ne dirêj di şeva Newrozê de ya ku qezenca wê ji girtiyên Diyarbekrê û xelkên şehîd ên Helebçe re diçû, disa dengbêjên me bi kincên pêşmerge derketin ser sehnê û destên xwe li sînga xwe xistin û bi yek dengî gotin; şabaş Kurdistan û bimirin kedxur! Û mîna her sal stranên xwe yê berî gemiya Nebî Nuh di devê xwe de çûtin. Bi xwe Şivan wilo Xezal-Xezal di devê xwe de pûc kir, heya Xezala me bû kevrosk û li ber çavan reş bû.

Na heyran, kuliyan devê dengbêjên me nexwarine. Wan bi yek gepê hemberî hemû girtiyên Diyarbekrê (tevî ku girtiyan demek dirêj nexwaribûn jî) xwarin. Û ji xelkên şehîdên Helebçe bêtir daqurtandin. (\*)

Em tēkili jihevderxistina vî hesabî nabin hûn bi xwe jî hev derxînin. Û me ne ji dilbijokî û çavreşî ev îstatîstik ji we re belav kir û em di

wê nerinê de ne ku alikariya hunermendan pêwîst e, çilo alikariya hunermendan ji gelê wan re. Leyse peyv her peyv dimîne û di mûsabaqa stran û mûsiqa de em bê par man. Li gora gotinên zarên şîrhelal ên di vî warî de tişteki dizanin, strana me ji ber peyvên xav, mûsiqek ji ya ewrûpî yan ji folklorê kurdî bi dizî wergirtî û zengilokên lastîkî, bê xelat man.

Êdî hûn dikarin bibêjin; we xwelî li serê me kirina, we di çî de xelata yekemîn wergirtiye? Pirsra we di çiyê xwe de ye û hun li min negrin, heger ez ji dûrayî bersivê bidim.

Dibêjin ku wezaretê swêdî ya telefonan civînek fireh li dar xist (hun dikarin bipirsin îcar ev çiyê? Ma ne min jî we re got; ezê hinekî di bersiva xwe de bi dûr kevîm). Wezîrê swêdî bi mamûrên xwe re mijûlî her çar kitêbên ku navên kesên xwedî telefon, bûn. Piştî çend rojan jî civîna xwe û danûstandîna bi datayê re wan naskir ku kurd jî hemû kesan bêtir dipeyivin. Û jî ber qerwerkên bi telefonan lista (fatura) herî giran kurdekî swêdî wergirt. Li gora vê faturê kurdê me yî swêdî di hundirê sê mehan de, bi 25 hezar kronî axifibû. Wezaretê, xelata wî jê re bi rê kir û bi saya serê wî me kurdan jî piştî xir û cirek dirêj, xelata yekemîn di warekî de qezenç kir.

Erê me xelatek yekemîn wergirt û dengê wê gihîşt welat. Xelkên me jî ji ber vê nûçeyê, guhên xwe miç kirin, çavên xwe beloq kirin. Lê dema qenc naskirin ku 25 hezar kron dike şeş milyonên tirkî, vêga devê xwe jî hev vekirin û guhê xwe girtin. Tiştê em pê nizanin û jî we bersivê dixwazin ev e: Gelo çima xelkê me yê li welêt devê xwe vekirin û guhê xwe girtin?

Ji bo ku xelata vê pirsê bibe ya min, ezê berî we bersivê bidim; devê wan jî hev ma, da ku hinek kron di devê wan keve. Û wan guhên xwe girtin, çimkî ewê nema bixwazin dengê dengbêjên "pere-weran" bibihîsin.

(\*) Hatina şeva Newrozê li gora îstatîstîka Federasyonê; Ji firotina bilêtên şeva Newroza 1988'an 75.000 kron e. Alîkariya ji maqamên Swêdî 23.000 Kr.

Mesrefa Şevê: Ji bo Şivan 10.000 Kr.

Ji bo Şîrinê 8.500 Kr. Ji bo Rezazî 7.000 Kr. Ji bo koma Naz 1.000 Kr. Ji bo video 9.000 Kr. Ji bo Def-Zirne 2.000 Kr. Kirya Salonê 27.000 Kr. Ceza gemara ku kurdên Ewrûpî li pey xwe hiştibûn 12.000 Kr. Koma zarokan (4 salî) 0000 Kr. Koma zarokan (12 salî) 0000 Kr. Koma Dîlan 0000 Kr. Koma Govend 0000 Kr.

## AGAHDARI

## ئاگادارى

- موميد طيب - حممه سعيد حسن - خليل دهوكى -  
 ناسى رهباتى - محفوظ مائى - سولهيمانى قاسميانى -  
 رزگار عهبدوولا - ماليمانز - تالان سردهشتى -  
 ئەمىن سەندى - ئازاد •  
 كات : رۆژى يەكشەممە ۸/۵/۸۸  
 كاتژمىر : دووى پاشنپوهرۆ  
 شوپىن :

كۆمىلى كوردى لە ستوكهولم دوو سيمينارو كۆريكىسى  
 شيعرى لە ودرزى چالاكيه كاتى كۆمەلەدا پيشكەش  
 دەكا •  
 ۱- كاك ماليمانز سيميناريك لە سەر ميژوى لىسه  
 ناوبردى كورد لە كوردستانى باكورددا پيشكەش دەكا •

كات : رۆژى شەممە ۲۳ / ۴ / ۸۸

كاتژمىر : دووى پاشنپوهرۆ  
 شوپىن :

BRYGGHUSET

NORRULLS GATAN 12

T \_ ODENPLAN

۲- كۆريك بو شيعر خوينايموه •

كە گەليك لە شاعيرانى كورد تيدا بەشدار دەبن ، لەم  
 كۆره دا ئەم برا شاعيرانە شيعر دەخوينايموه :

HUSBY TRÄFF

T \_ HUSBY

۳- كاك فەخرەددىن گەردى سيميناريك لە سەر  
 فولكلۆرو گۆرانى كوردى پيشكەش دەكا •  
 كات - رۆژى شەممە ۱۴ / ۵ / ۸۸

BRYGGHUSET

NORRULLS GATAN 12

T \_ ODENPLAN

شوپىن :  
 كاتژمىر : دووى  
 پاشنپوهرۆ

## كرمانج

لەناو دلى نيوه شهودا  
 كه يه كترمان بوزيهوه  
 چاوه كانت خوينايموه ده رشت  
 ده ورو بهرت، به كه له سه رى كۆرپه كانت ته نرابوهوه  
 به غه مگىنى له ژير زمان  
 سه روو ديكت ده خوينايموه  
 تيت نه گه يشتم،  
 به لام نه وه نده حالى بووم  
 ده تگوت: نه گه ر،  
 به له تله ت بوونيشم واز نه هيتن،  
 بمسو تيتن  
 سه ر نه نجام، ئەم جيهانه  
 ده خمه پاشكۆى خۆم و هه تاو و تريفه ي مانگ  
 به يه كه وه له باوه ش ده گرم.

خاك

ماموستا حاجی جندی بهو نووسینه گرانبه‌هایانه‌ی،  
به‌حق نه‌و نازناوه‌ی حلال کردوه- شیخی کوردناسی.  
له کۆتایی ئەم وتاره لیستی هه‌ندی له به‌رهمه‌کانی  
ماموستا حاجی جندی بلۆ ده‌که‌ینه‌وه و هیوادارین  
روناکیرانی کورد که‌م تهرخی نه‌کن بۆ بلۆکردنه‌وه‌ی  
هه‌موو به‌رهمه‌کانی- زانای هیژا حاجی جندی.

قوناخه جیوازه‌کانی میژوو دا.

بیگومان وهرگراندنه‌کانی حاجی جندی له کوردی به‌وه  
بۆ نهرمندی و به‌پینچه‌وانه، کولتوری هه‌ردوو میللەت  
ده‌وله‌مەند ده‌کا و ده‌بیته هۆکاری نیزیکی بوونه‌وه‌ی گەل  
و نه‌تسه‌ه‌کان و دۆستایه‌تی و هاوچاره‌نووسی کورد و  
نهرمان نیشان ده‌دا.

- ئەدهبی کوردی له نهرمانستانی سوڤیه‌تی- یریفان . ۱۹۵۴

- پینشه‌کی و پراویز بۆ «مەم و زین» به‌زمانی نهرمانی ۱۹۵۶

- ئەفسانه‌ی میلی کوردی- به کوردی. یریفان ۱۹۶۹

- کورته‌ی میژووی ئەدهبی کوردی له نهرمانستانی سوڤیه‌تی.

یریفان ۱۹۷۰

- رۆسته‌ی زال. له گەل پینشه‌کی و به‌راوردکردن. به زمانی

رووسی. یریفان ۱۹۷۷

- به‌هار هات. رومان. ۱۹۷۸. رووسی.

- فۆلکلۆری کرمانجی ۱۹۳۶ یریفان

- کارووکلیکا- سلیمانی سه‌لفی. داستانیکی کوردیه. یریفان

به‌زمانی نهرمانی ۱۹۴۱

- فۆلکلۆری کوردی له تۆمارکردن و پراویز دانانی حاجی جندی.

یریفان. به کوردی ۱۹۴۷.

- ئەکادیمی مار و کوردناسی. له گۆفاری زانکۆی یریفان.

ژماره ۳. ۱۹۴۸ به‌زمانی نهرمانی.

- کتییی چیرۆک و داستانی کورد- کورد ئۆغلو- تۆمارکردن

وهرگیران و پینشه‌کی حاجی جندی. به‌زمانی نهرمانی.

## نامه‌یه‌ک بۆ بی‌رت

چل و چینه‌ه‌کی دیمی خسته ناو تووره‌که‌یه‌که‌وه و نه‌وه‌ی پینشووی  
وه‌کوو تابلۆیه‌ک پینوه لکاند و دایه کۆلدا. نیستا چل و چینوم وا به  
کۆلی ژانمهره و ئەم برۆوسک ناسا و سه‌رگرەدان به‌نووێ کۆپێ  
عه‌شقا ناسمانی خەم شه‌قار ده‌کات. ناخۆ ده‌بێژیته‌وه؟! ناخۆ  
له‌کوێ له‌تگر ده‌گری؟!  
ناخۆ که‌لکی خه‌لکی ده‌گری؟! هه‌ر کاتی نامه‌که‌م خویندیته‌وه،  
ولامت ده‌ده‌مه‌وه.

هۆشیار

۲۱/حوزه‌یران/۱۹۸۵

قۆخی حاجی مه‌حمود - شاریاژنیر

(۱) بی‌رت: پالهنانی شانۆنامه‌ی «بووهرگ»ی «لانگستۆن هیوز».

(۲) کالیاییف: پالهنانی شانۆنامه‌ی «راستان»ی «کامز»یه. مرۆفی

سۆسیالستی شۆرشگێڕ که «گرانۆک»ی ره‌مه‌زی سته‌م و زۆرداری  
تیوود ده‌کات.

(۳) داری به‌ر هه‌ره‌س: نه‌و داره‌یه که له لاپاله‌کاندا ده‌رپوینت و

زۆریه‌ی ره‌گه‌کانی به‌ده‌ره‌وه‌یه و، ها‌کا هه‌ره‌سی به‌فر رایمانی.

نامه‌یه‌ک به نازناوی «بی‌رت» - که چاری نه‌مپچیه‌وه - سه‌ سال  
له‌مه‌یه‌ر گه‌یشته ده‌ستم. (۱) یه‌کسه‌ر بێره شیعره‌که‌ی حه‌رزه‌تی  
مه‌حوی - که هه‌میشه له‌سه‌ر زارت بوو - ، به ده‌نگ و ناوازی  
خۆت مه‌ستانه په‌رده‌ی خه‌یالی له‌راندم:

له شاگردانی کۆپێ عه‌شقم و چی هه‌ر له‌وێ نه‌گرم

که من مشتێ چل و چینوم، به‌چی بم که‌لکی کن نه‌گرم

«فلاش باگه گه‌رامه‌وه بۆ نه‌و رۆژه‌ی ژانم دایه کۆلی چل و  
چینۆی خۆم و له‌تری گه‌رانم دا به‌نووێ کۆپێ عه‌شقا و، به پێ  
خاوسی کۆپێ رۆکه‌م دایه به‌ر.

له‌گەل هه‌ر هه‌وراز و نشینۆیکدا به چل و چینۆ و کۆلی ژانمه  
گه‌ره ده‌بووم. له هه‌لنیز و پله رۆده‌کانداچوم که‌وت به‌و  
«بالدارانه‌ی بالیان رزانده‌بووه. رۆژان .. مانگان ... سالان،  
تێپه‌رین. که‌سیک نه‌بوو بیدوینم .. که‌سیک نه‌بوو بیدوینتی. کلۆر  
بووم. زۆرم دیت، که‌متر فیز بووم. که‌م دیت، زۆتر فیز بووم.  
چاوم به «کالیاییف»یک نه‌که‌وت. (۲) له‌ژێر باری قورسی ژاندا  
شه‌که‌ت بووم. به‌ناوی کۆپێ عه‌شقه‌وه چه‌ندین ترووسکاییم بینی.  
چل و چینۆ هه‌لۆیسته‌یه‌کی کرد، ژانم له‌نگه‌ری نه‌گرت. ناویندانه،  
خۆم به داری به‌ر هه‌ره‌س دانا. (۳) ژان بوو به کینۆک و  
داپه‌روخانم.

چل و چینۆی کۆکریمه‌وه. لولاچه‌کانی راست و چه‌پ لیکام.  
که‌له‌سه‌ری خسته‌مه نیوان به‌شی سه‌رووی لیکه‌راوی لولاچه‌کانه‌وه.

شارستانیەتی موزقاییەتی.دا. بەرھەمە بەنرخەکانی حاجی جندی، ئاویئەتی میژوو و نیتنوگرافی و ئەدەب وژیانی کۆمەڵایەتی کوردواریمان دەخاتە بەرچاوی، زەمینە خۆش کەرە بۆ لیکۆلینەو و نووسنەوێ میژووی بییری کۆمەڵایەتی لە کوردستان. چونکە حاجی جندی رۆلیکی یار و گەورەیی بینیبوو لەناسندن وگەشە پێدانی لیکۆلینەو و کۆکردنەوێ فۆلکلۆر و کەلەپۆری نەتەوایەتی و لیکدانەوێ لەسەر بنچینەتی زانستی پیشکەوتنخوازانە. بەو کارەش حاجی جندی بنەمای زانستی لیکۆلینەوێ میژووی کۆلتوری گیانی «رومی» و بییری کوردی داریشتوو. حاجی جندی تەنیا فۆلکلۆری کۆنەکردۆتەو، بەلکۆر ئەنالیزەتی کردووە و تحقیقی کردووە و هەندێ جار هەولی ئەوێشی داووە دەقیکی فۆلکلۆری کوردی بەراورد بکا لە گەل دەقیکی فۆلکلۆری گەلانی دراوسی، بەتایبەت ئەو دەقانیەتی لە بابەت و شیوە لیک دەچن، بۆ سەلماندن و دەست نیشان کردنی رەسەنی دەقە کوردیەکی و نیشان دانی ویکچوون و جیاوازی دەقەکان.

هەرەکی لە سەرەوێ دا گۆتراو، مامۆستا حاجی جندی ماوێ ۱۹ سال خەریکی مامۆستایی بوو دەرزێ گۆتووتەو لە زانکۆ و ئامۆزگاوی ئینستیتیوی هونەری پشت قەفقاس.

میژووی دەست پێکردن و نەش نەما کردن و بەرھەوێش چوونی ئەدەبی کوردی لە سۆڤیەت بە خامە رەنگینەکی مامۆستا حاجی جندی تۆمارکراوە و نووسراوەتەو، بیگومان ئەو کارە زانستیەتی حاجی جندی شوینی تایبەتی هەییە لە میژووی کوردۆلۆجی سۆڤیەتدا.

پەرتووک و وتارە زانستیەکانی حاجی جندی لە بارەتی نۆستیایەتی و پێوەندی گیانی و تیکەلۆی کۆلتوری روحی ئەرمەن و کورد، بنەمای بەھیز کردنی نۆستیایەتی رۆلەکانی ئەرمینی سۆڤیەتی وولاتی سۆڤیەت.

حاجی جندی زانایانە، دەقی فۆلکلۆری کوردی هەلبژارووە وەرگێراوەتە سەر ئەرمەنی، بەمەش باریکی باشی رەخساندووە بۆ گەلی ئەرمەن شارەزایی و ناسیاری لە بارەتی گەلی کورد و میراتی نەتەوایەتی کورد پەیدا بکا، لە هەمان کاتدا حاجی جندی خامەکی تەرخان کردووە بۆ وەرگێرانی هەلبژارە لە ئەدەبی ئەرمەنی، بە تایبەتی کە لە نووسەرانی هەک: ئۆ. تومانیان، ئا. ئیساکیان، ی. گارنیش و چەندانی تر، حاجی ئەو دەقانیەتی هەلبژارووە کە ئاویئە و رەنگ دانەوێ چارەنووس و دەردی بارۆنۆخی هەردوو گەل لە

گەنجینەتی فۆلکلۆری کوردی بوو. لە سالی ۱۹۴۰ حاجی جندی برۆنامەتی نوکتۆرای وەرگرتوو لە سەر داستانی «کار و کولیکا» ی سلیمانی سەلفی.

مامۆستا جندی هەوێکی زۆری داووە بۆ ئامادەکردنی مامۆستایانی کورد و دانانی پرتوکی قوتابخانە و فیزگەکانی سەرەتا و ناوەندی کوردی لە ئەرمەنستان.

حاجی جندی تا نیوێ نووێ پەنجاکان بە دەھا لیکۆلینەوێ زانستی لەسەر کۆلتوری کوردی بلۆ کردۆتەو، ئەوێش بۆتە هۆی پایەتی تووژەری بەرز و پیشکەوتووی پێدراو لە ئامۆزگاری رۆژەلاتناس لە ۱۹۵۵/۱۰/۲۶. وەرەوھا لە سالی ۱۹۴۰-۱۹۵۹ وەک مامۆستای یاریدەر «یاریدەری پروفیسۆر» لە ئینستیتیوی ئەدەب کاری کرد. لە سالی ۱۹۵۹، داوی ئەوێ بەشی کوردناسی لە ئامۆزگای رۆژەلاتناسی ئەرمەنستان کراوەتەو، بەرپساری بەشی کوردی پێدراو. حاجی جندی لەو ماوێدا بەردوام بوو لە نووسین و بلۆکردنەوێ وتار و کتیبی زانستی لە سەر کورد و کەل و پۆری نەتەوایەتی. مامۆستا جندی لە ۱۹۶۴/۳/۱۴ بەرگری لە نامەتی نوکتۆرای زانستی کردووە. ئامۆزگاری رۆژەلاتناس « ئەرمەنستان کارە زانستیەکانی حاجی جندی بەرز نرخانندووە و لە ۱۹۶۶/۴/۲۱ پلە پروفیسۆری پێ بەخشبوو و سەرپەرشتی بەشی کوردیش کردووە.

لە سەرەتای حەفتاکان، کە لەعیراق کۆری زانیاری کورد دامەزراو، مامۆستا حاجی جندی سی بەئەندامی یاریدەر هەلبژاردووە. هەرەوھا لە سالی ۱۹۷۸ کە ریزیمی بەغدا، کۆری زانیاری کوردی هەلوەشانندووە و بەشی کوردی دامەزراوە لە کۆری زانیاری عیراق، دەستەتی کورد دووبارە مامۆستای جندی بەئەندامی یاریدەتی کۆر و دەستەتی ناوبراو هەلبژارد.

حاجی جندی لە ماوێ ۶۰ سالی کاری زانستی دا، رۆلیکی دیاری لێستووە لە بواری تەئویرکردنی رۆلەکانی گەلی کورد لە وولاتی سۆڤیەت و هەرەوھا لە پیناساندنی کۆلتوور و فۆلکلۆر و ئەدەبی کوردی بە گەلانی نۆستی لە سۆڤیەتدا. حاجی جندی چەندەھا پرتووک و تیکستی «دەقی» فۆلکلۆری کوردی وەرگێراوەتە سەر زمانی بیگانە و چاپی کردووە و پەراوێزی بۆ نووسیووە. بیگومان کارە زانستیەکانی حاجی جندی کەرەستەتیکی زۆر دەولەمەندی داووەتە دەست ئەوانەتی دەیانەوێ گەلی کورد بناسن و رۆلی ئەو گەلە بزانی لە دەولەمەندکردنی

## یۆبیلی ههشتا ساله‌ی زانا و نووسهری گهره‌ی کورد حاجی جندی



Heciyê Cindî

تەرخان کرهه بۆ خزمەتی گەلی کورد و دەوریکی و شیارانە یاری کرهه له پەرورده‌کردن و پێزراگە یاندنی رۆڵەکانی گەلی کورد له ئەرمینای سۆڤیەتی و کورده‌کانی دانیشتیوی کۆمارەکانی پشت قەفقاس. پێگومان زانا نیشتمانپەرور و پێشکەوتنخوازەکانی ئەرمەن دەوریکی گهره‌یان بینوه له پەرورده‌کردنی حاجی جندی به گیانی خوشەوێستی گەل و نیشتمان، ئەوانیش بووینه نموونه بۆ خزمەت کردنی گەلی کورد و بەهێزکردنی نۆستایەتی نیوان ئەرمەن و کورد.

حاجی جندی له سالی ۱۹۳۰ زانکزی یەریقان «کولێجی ئەدەب و زمان»ی تەواو کرهه. و ۱۹۳۴ یەکیک بووه له بەشداریەکانی یەکەمین کۆنگرە‌ی کوردناسی سۆڤیەتی له ئەرمەنستان. هەر لهو سالانە دا و بەپێی بریاری کۆنگرە‌ی ناوبراو، حاجی جندی له گەل ژمارەیه‌ک له زانا فولکلۆریەکانی ئەرمەنی خەریکی کۆکردنەوه‌ی

### بروسک

له ۱۸ ئاداری، زانای بەناوبانگی کورد پروفیسۆر حاجی جندی تەمەنی گەشتە ۸۰ سال، ۶۰ سالی له خزمەتی ئەدەب و فولکلۆر و میژوی نیتوگرافی گەلی کوردمان دا گۆزەراند. هیوای دارین تەمەن درێژ تر بێ، تا نووسین و لیکۆلێنەوه‌ی گرنگ تر و گران بەهاتر پێشکەش به گەلی چەوساوه‌ی کورد بکا و گەنجینه‌ی دەوله‌مەندی نەتەواپەتیمان له وون بوون رزگار بکا..


حاجی جندی یەکیکە لهو کەله پیاوانە‌ی گەلی کورد، که پینۆستە له ژیاندا، بایەخیکی تایبەتی پێ بدی و نووسینەکانی نووباره و سنی باره چاپ بکریته‌وه، نەک تەنیا له سۆڤیەت، بەلکو له ئەوروپا و کوردستاندا. دەبواپه ئەم سال له یۆبیلی ۸۰ ساله‌ی مامۆستا حاجی جندی کۆمه‌له کۆلتوریەکان و مەله‌بەندە رۆشه‌نپیری یەکان ئاهەنگی بۆ ئەو زاتە گهره‌یه بگێرن... نەک که چاوی لیک نا، فرمیسکی بۆ برژین و پێی داهاه‌لبێن.. با ئایۆ حاجی به چاوی خۆی بیینی گەلی چۆن ریزی لێ دەگرن، به گوی خۆی بییستی که ئەوه‌ی نۆی کورد ئەمەک داره بۆ خزمەتەکانی.

ئیمەش بەو بۆنەیه‌وه، ئەم وتاره دەنووسین له‌سەر ژیان و بەرهمەکانی پروفیسۆر حاجی جندی.

حاجی جەواری جندی له ۱۹۰۸/۳/۱۸ له گوندی «یەمان جایەر» له ولایەتی قارس «له کوردستانی تورکیا، له بنەماله‌یه‌کی چۆتکار هاژۆته نوینا. له کاتی کوشتاری ئەرمەنەکان نارچە‌ی خۆی به‌جێ هێشتوه و رووی کردۆته ئەرمینیا. بێ بەش بووه له سۆزی دایک و باوک، بۆیش ژیانیکی زۆر دژواری بەسەر برهوه، تا شۆرشێ ئۆکتۆبەر بەریابوو، حاجی جندی و هەزارانی تر له برسیەتی و بێ‌کەسی رزگار کرد و ژیانیکی سەرپه‌ست و به‌ختیاری بۆ دابین کرد و ریگی له بەر دەم کراوه‌تەوه بۆ خۆ پێزراگە‌یاندن و خویندن و کار. حاجی جندی، رۆله‌ی بێ‌کەس و هەژار، دواي شۆرش ئەو هەله‌ی بۆ ره‌خسا، بییته یەکیک له کەله پیاوه‌کانی کۆلتوری ئەرمینیا‌ی سۆڤیەتی تا پایە پروفیسۆری پێ دراوه.

حاجی جەواری جندی هەموو توانا و زانایی خۆی

## نه‌ورۆز له ستۆكهۆلم



فیدراسیۆنی کۆمه‌له‌ی کوردستانی‌ه‌کان له سوێد له رۆژی ۱۹/۳/۱۹۸۸ ئاهه‌نگی‌کی گه‌ره‌ی گه‌راوه له هه‌ولی کۆنسه‌رت هه‌وس به بۆنه‌ی جه‌ژنی نه‌ته‌واپه‌تی گه‌لی کورد - نه‌ورۆز - وه‌.

له ئاهه‌نگه‌ دا زیاتر له ۲۰۰۰ هه‌زار که‌س ئاماده‌بوون. ئاهه‌نگه‌ که له کاتۆمیزی ۱۸/۳ ده‌ستی پێ‌کرد. له سه‌ره‌تا دا هه‌قال که‌یا ئیژۆل سه‌رۆکی فیدراسیۆن و تارێکی خۆپنده‌وه ده‌رباره‌ی بارووبۆخی کوردستان و رۆژمه‌ داگیرکه‌ره‌کانی تێدا رسواکرد. له ئاهه‌نگه‌ دا ژمارێکی زۆر له بروسکه و نامه‌ی پیرۆزیایی بۆ شه‌وه‌که ره‌وانه کرابوو... هه‌روه‌ها به‌شدارانی ئاهه‌نگه‌که دقیقه‌یک وه‌ستان له سه‌ر گیانی شه‌هیدانی هه‌له‌بچه. له‌م شه‌وه‌ دا هه‌نهرمه‌ندان فه‌ره‌اد باپان، ناسری ره‌زازی، شقان و گولستان و شیرین به‌شداریان کرد. هه‌روه‌ها کۆما زارۆکی بۆلنیز منداله‌کانی باخچه‌ی مندالانی کورد له تینستا کۆما گۆشه‌ند و دیلان و تپیی نامۆ «ناز» به‌شدارێ ئاهه‌نگی نه‌ورۆزیان کرد.

## جه‌ژنی نه‌ورۆز له سوندسفال

به سوورێکی تر نه‌ستیره‌ی ئینسان گه‌م  
قه‌ومی کۆنی خسته‌وه جه‌ژنی ناگه‌م

گروه‌ی کانی «سوورنۆکه‌ر-شیلیایی-یۆنانی-کۆمادیلان و کۆما زارۆکان له بۆلنیز» هه‌روه‌ها هه‌نهرمه‌ندان فه‌ره‌اد باپان و شقان په‌روه‌ر له ئاهه‌نگه‌که‌دا به‌شداریان کرد. له‌و شه‌وه‌ دا به‌ خواردنی کوردی میوانداری له میوانان کرا.

له کۆتایی پرۆگرامدا خه‌به‌ری به‌ریوه‌چوونی خۆپیشاندانی فیدراسیۆن دژی کاره‌ساتی هه‌له‌بچه له رۆژی شه‌موی ۲۶/مارس به‌ میوانان راگه‌یاندرنا و دواپان لێ‌کرا به‌گۆیره‌ی نیمکان به‌شدارێ تێدا بکه‌ن. له‌و ئاهه‌نگه‌ دا زیاتر له ۶۰۰ که‌س به‌شدار بوون. له سه‌ر داوای کۆمه‌له‌ی کورد له سوندسفال دوو هه‌والی سویدی سه‌ر به‌ ته‌له‌فزیۆنی کابل له شاره‌ فلیمی فیدیبۆیان تۆمار کرد. شایانی باسه‌ که «کۆمه‌له‌ی نیۆنه‌ته‌وه‌یی له سوندسفال» بۆ ئاماده‌کردنی ئه‌و رۆی و ره‌سه‌ یارمه‌تی کۆمه‌له‌که‌مانی کرد.

کۆمه‌له‌ی کورد له سوندسفال سه‌ره‌رای تازیبه‌باری کوردان له چوار قورنه‌ی جیهان له به‌ر کاره‌ساتی هه‌له‌بچه، بۆ دیاری‌کردنی ئه‌وه‌ی که کورد وه‌ به‌رنادا و نه‌ورۆز به‌ نیشانه‌ی به‌ریه‌ره‌کانی و درۆزه‌ پێدانی خه‌بات بۆ ئازادی و سه‌ربه‌ستی داده‌نی. بۆ ئاساندنی گۆشه‌یه‌ک له رۆی و ره‌سمی نه‌ته‌واپه‌تی کوردان به‌ سویدی‌یه‌کان ئیواره‌ی رۆژی هه‌ینی ۲۵/مارسی/۱۹۸۸ له هه‌ولی ئاوالی خۆپنده‌گی هیدبه‌ریسکا که له نیۆه‌راست شار هه‌له‌کوتوه‌ رۆی و ره‌سمی نه‌ورۆزی پیرۆز کرد. به‌رنامه‌ی نه‌ورۆز بریتی بو له و تارێک به‌ کوردی و سویدی چهند هه‌له‌په‌رکی‌ی کوردی و بیگانه‌ که له لایه‌ن

# په ريانگ

نورگانی فیدراسیونی کومله کوردستانیه گانه له سوید

بهرپرسيار:

مه حمود له موفندي

دهستى نووسهران:

باقى نازق ، جمشيد حيدمرى ،  
دارا رشيد ، فه همى كاكه يى ،  
س . ريفينگ ، مونه يه د تميب

تابونى سالانه ۱۰۰ كرولى سوئديه بل دوزگانان ۲۰۰ كرولى سوئديه

دهستى نووسهران بهرپرسيار نيه له نووسين و وتارمكاني فیدراسیون.  
نور نووسينانمى بل بهريانگ دى، گهر بلو نكریتكوه بل خارونه كسى  
ناگريتهوه.

Berbang

Box. 45205, 104 30 Stockholm

643880-8

08-68 60 60

نارنیشان:

پوستگير:

تلهفون:

Hejmar: 4/88 (49), 21.03.1988

خوينى شه هيدانى هلمبجه، نهوتى چراى  
ئازادى كوردستانه ...

ئه م ساليش بوهك هموو ساليك له ئاوارمى ، دوور  
له خاكى نيشتمان، خومان بو جيزن ناماده كرديو ،  
بانگهوازيهان له همزاران كورد گيرابوو، بو شموى  
نهوروز ۰۰ ئيوارهى ۱۹ ئادار ، نزيكهى دوو همزار  
كوردى ئاواره ، له هولى كونسييرت هروس ، كوچوو بونهوه ،  
له نكارو پيشكشى كهري ئاههنگ ، پروگرامى برى و  
داواى له خهلكه كه كرد دهقيقهيك بى دهنگ وهستان .  
ئاگادارى راگهياند كه له روزى ۱۶ ي ئادار دا ، دواى  
هيرشى ئيران بو كوردستان وداگير كردنى خورمال و  
هلمبجه ، ريژيمى بهعسى عيراق ،شاره جوانكيلهكهى  
هلمبجهى به چمكى كيمياوى و گازى ژاراوى بومباران  
كرده ، ونزيكهى ۵۰۰۰ هاونيشتمانى كورد ، كه زوربهيان  
ژن ومندال وپير كوژراون وپتر له ۸۰۰۰۰ بربيندار هميه .  
داگير كهراى كوردستان ، ديسان جيزنيان لى كردين  
بهشين . با داگير كهراى كوردستان باش بزانن  
نه گازى ژاراوى ، نه چمكى كيمياوى ، نهكوشتن ومال ويرانى  
چوك به خهباتگيرانى ريگاي ئازادى دانانين ، بهلكو  
خوينى شه هيدانى هلمبجه و هموو شه هيدانى ريگاي  
ئازادى كوردستان ، چراى ئازادى گمشتر دهكاو بانگه -  
وازيهان لى دهكا : بو بهكگرتن و بو توله سمندن .  
نهمرى و بهرزى بو شه هيدانى ئازادى و سمر بهخويى  
كوردستان .

\* بهريانگ \*

# پەڕیانی

VAN

- SOLIDARITET

HEVALTI-DOSTANI-PISTGIRI

کۆتایی ئەگەر سەختی کۆمەڵە کار و سەختی کۆمەڵە کانه له سوێد

REV NE KURTIRIN!  
MANS AN VI STARKARE!

**NEWROZ PIROZ BE**  
Kurdiska Riksförbundet

STUTTGART  
DEN TERNINGEN

